BIGIRNIJE

Bigirnije!
Yariya bi gizîlankên min neke.
Ez ê havî,
Tu ya yaxî
Pîratiyê lêvên me yên qurmiçandîn
Demê em hêlayîn û
birbezanê ye,
Dîlaneka bê serçemke,
Hosa ye bê hodeye
Kes di ezmanê kesê nagehe,
Mirinê taxên bajêrî yên kurtankirîn
Sêbera bejna te
Tavê ya lêdayî
Xidro rojê (…) caran peçrûme dike
Ji bîrneke!
Ez ê havî,
Tu ya yaxî,
Di êk kevlojank de em dijîn û
eşqa me eşqeka sermedî ye
Rojê sê caran dihilêt
Bîst û du katan ji xwe dide
Her katek (…) şaka hembêz dike û
Her şakek xwe bi kirasekê dixemlîne,
Spêdeyê rengekê dike ber xwe û
Êvarî êkê dî li ber xwe dike
Ji bîr neke!
Ez ê ha…ha… ha.
Tu ya yaxî…xî…x.

Hemdî Remezan Eredinî